
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
* **Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (114)* *Sal 20 Rezber 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


# Rewşa Dijwar û Gelê Zindî û Pêdar!

▪ **Rozad Elî/Desteya sernivîser**

**B**abelata pir giran a qeyrana Sûryê, hemî aliyên jiyana welatiyan daye ber xwe. Ji pariyê nên û dilopa avê de bigire û ra bigihê warê ewlehî û jiyana mirov.

Di warê aborî û jiyana mirov de, roja îro li piraniya deverên Sûryê, hertiştek li bazarê li gora buhaya Dolar tê kirîn û firotin. Ango tiştê ku berî qeyranê bi 50 L.s bû, ew niha bûye dora 350L.s. ango tişt heftaq buha bûye.

Li aliyê din, û li ba piraniya pir ji xelkê me, qezenc û dahatî (warêd) jî pir zêde ne bûne. Eger mirov karmendê dewletê be, bûye bêtirî sê salan mihaneya wî zêde ne bûye. Û eger pîşekar be, rewşa xirab a kar, û bazara guhêzok û nerawestî jî li ber çava ye û wî dixe bin dijwariyên giran. Lê eger cotarî be, dîsa jî rewş pir xirab e, û ji tukesî netê veşartin; Ji aliyekî de pêdviyên çandiniyê pir buha bûne û ew jî li dolaran dikev, û ji aliyekî din de, piraniya navçên kurdî di dorpêçkirinê de ne, rê têne girtin, û gelek bazar jî kavil bûne. Ew jî dihêlin, ku piraniya caran pîşekar û cotarî gelek ………….. 2


Jiyan li bajarê Efrînê


Jiyan li kampa penaberiyê

## Li Efrînê..
## Hilbijartinên Rewşên Taybet !!

▪ **M.Elî**

**L**i dehê meha Rezberê(Êlûnê) hilbijartinên serokên şaredariyan li herêma Efrînê li dar ketin. Karûbar û amadebaşiyên hilbijartinê, serûber ji hêla Rêvebirya Xweser(RX) û Tevger Civaka Demokrat (TEV-DEM) de hatin kirin. Wan hejmara şaredariyan û şêngehên bi ser wan ve bi nav kirin, Komîseriya Giştî ya Hilbirartinan ava kir, ciyên sandiqan vebjartin, endamên komîtên sandiqan ………… 6

## Beriya Cizîrê û Mêrdînê Nas bikin!



▪ **Konê Reş**

**C**izîra Sûriyê dilê Mezopotamya ye û Beriya Mêrdînê kezeba wê ye. Beriya Mêrdînê landika şaristaniya mirovahiyê ye. Cihê hevdîtina nijadên ku ji bakur de daketine, pêrgî nijadên ku ji başûr de hatine bûn.. Gelek rojên xêr û şer di ser re derbas bûne; bilind bûye û careke din daketiye, aramî lê belav bûye û wêraniyê careke din konê xwe di ser re vegirtiye, çend carekê Moxolan bi ser de girtine, xelkên wê kuştine, malên wan wêran kirine û tovê jiyanê jê qut kirine.. Lê va careke din, piştî 600 salî ji wêraniyê û ji dor sed salî de, jiyanê hêlîna xwe bi xurtî têde ava dike, careke din dengên melayên mizgeftan, zingilên ……... 10

# Dîsa Koçberî!

Dr. M. Zeyno



Di van du-sê salên dawî de, bi hezaran Kurd ji herêmên xwe li Sûriyê koçî welatên derve bûn û ev tevger ta vê kêlîkê berdewam e û tu kes nikan e dawiyê wê nîşan bide. Ev koçberî tiracîdî û xişim û bêtareke mezin e bi ser welêt û şêniyên me de hatiye. Bûyereke reş e dema mirov ji cih û warên xwe, ji mal û xanî, ji zevî û gund …....

11

**Rewşa Dijwar … Dûmahîk**

dijwariyan bibînin, toşî ziyanên mezin bibin, sermiyanên wan ji dest herin, di bin dênan kevin, di bin zexta jiyana rojane de binalin û neçar bibin li çareyine din ên tal bigerin.

Di nava van dijwariyên îjdil û kavildar de, mirovê Sûrî û Kurdên me jî di nav de, pir li xwe diheyirin û gelek ji wan neçar dibin pîşeyên xwe biguhêrin yan jî berdin, û bi her şêweyekê hewil bidin pêdviyên jiyana mal û zarokên xwe bicî bikin.

Ji ber wê yekê jî, hinek ji xelkê me neçar dibin berê xwe didin derve û bi paş sînoran dikevin, hinek jî pişta nava xwe peht girê didin, diranên xwe diçirikînin, û eger bi çi hawî be jî, debara jiyana xwe û mala xwe dikin. Em hemî jî li bendê ne ku belkî (Xwedê) avekê li vî agirî bike û rewşa Sûryê berve aramî û çareseriyê here.

Wek mînak, li navçeke mîna navça me (Efrîn), ji bo meşandina jiyana rojane, derfetên debarê ji gelek deverên kurdî yên din pirtir in. Navça me ji hêla baranê de di pileya yekê de ye li Sûryê, li gelek gundan kanî û golên avê hene û ava wan ra dawiya Havînê dimînin. Çemê Efrînê, gola Meydankê û golên biçûk ên din jî mîna Gola Endarê û Bircê.. û hwd, jêderine herdemî ne ji avê re, di wan golan de gelek cureyên masiyan jî dijîn. Ji bilî ku li piraniya malan bîrên avê jî hene, û gelek mal ava baranê jî di serîncan de diparêzin. Xaka navçê jî ji hemî cureyên çandiniyê re dibe. Tu malên me li gundan tunene ku enkûreke xwe tunebe û bikêrî çandina hemî cureyên keskahiyên xwarinê ne tên. Ji bilî ku, navçe di warê çêrê de jî pir lêhatî ye. Gelek cureyên tilûr û lawirên çolê jî lê dijîn, ew jî ji bo nêçîrê û peydakirina goşt lêhatî ne.

Eger her malek çend bost xak di hewşa mala xwe de ji bo çandina hinek cureyên keskahiyê amade bike, ew malak di her werzeke salê de, wê kani be gelek nofên keskahiyên xwarinê biçîne û pê debara mala xwe bike, wek: Bextenîz, ze`ter, reşad, pîvazên şîn, sîr, bamî, fasûle, xes, tirp, hindib û gelek cureyên din jî.

Ew mala kane du mirîşkan û bizinekê jî tîmar bike, hêk û şîrmastê xwe jê bigire. Nimûneke din; dora pêncî gund li derdora gola meydankê hene, eger her malek di heftê de carekê here masiyan, û du kîlo masî bigire, ewê pêdviya mala xwe ji goşt û pirotîn peyda bike.

Kurd dibêjin ((Eger roj reş bû, tu kê jê reştir bî)). Ev jî rojine reş in û bêguman jî wê derbas bibin, lê gerek e em jê reştir bin û debara xwe bi her hawakî bikin. Gelê me yê Kurd ne zexel e, mirovên wî, nemaze jî dê û xûşkên me, pir zîrek û çalak in, ew (mêrên) rojên reş in. Dem û Rojên ku di ser me re derbas dibin pir dijwar in. Ew ji hêla siyasî de jî rojine dîrokî ne. Kî kani be di van rojan de xwe ragire, berxwe dide û li ser xaka xwe pêdar bimîne, paşeroj ji wî re ye û ewê li dawiyê bi ser keve. Di van rewşan û di vê mijara çarenûsî û dîrokî de, em bawer in ku ji gelê Kurd pêdartir tuneye. Ew gelê ku bi sedsalan xwe li hember zulmûzora bi dehan dewlet, impretorî, hêriş, ceng, talan, enfal, kîmiyebaran û her cureyekê ji cureyên zordariyê xwe ragirtiye, bêguman wê kani be ji vê qeyranê jî serkeftî derkeve, û ji nû ve, û bi hêvî û rengine nû ber ve rojê here û Newrozeke nû û nûjen bafirîne.

Nêrîna Azad

# Rojhilata Navîn
# Û Nîşanên Şerekî Cîhanî Yê Sêyemîn

▪ Merwan Berekat

Li Rojhilata Navîn roj bi roj kela şerekî mezitir bilind dibe, aliyên ku agirê vî şerî gur dikin gelek in û her yek ji wan li gora berjewendiyên xwe yên siyasî, aborî û yên stratîjî naxwezin ku agirê vî şerî were vemirandin.

***Li Sûriyê;*** Ev bûne pênc sal, ku rêjîma xwînî ya Elbe`s bi hemû çekan şerekî bê sinc û hovane bi gelê Sûrî re dike. Di vî şerî de, ji (% 30 ) bajar, bajarok û gund hatine hilweşandin, û hîn jî ev karê ne mirovane berdewam e.


Bi milyonan niştecihên Sûriyê û ji hemû pêkhateyan penaber û koçberî dervayî welêt bûne, bi sed hezaran jî zarok, jin, mêr û ciwan hatine kuştin, rêjeyeke nêzîkî wê jî winda ne û rewşa wan ne diyar e ku ew li kû ne û çi bi serê wan hatiye??

Di destpêka qeyran û şerê Sûrî yê navxweyî de, bi dehan dewletên hermê û yên cihanê diyar kirin ku ew dostên gelê Sûrî ne, lê wek Kurd dibêjin: *Gotinên li ber dîwaran li cihê xwe dimînin*. Wan tevan derew li gelê Sûrî kirin, û hîn jî pir aliyên ku xwe wek rikber nîşan didin bi wan bawer dikin!!

Roja îr, bi dehan dewletên Rojhilata Navîn û yên cîhanê bi şêweyên curbecur destêwerdana wan di qeyrana Sûriyê de heye. Hin bi hemû rêbazan piştevaniya rêjîmê dikin, Hin jî piştgiriya bêlûkên ku bi ser rikberê ve ne dikin. Lê çîrok ji wê mezintr e, û gerandeyên şerê ku tê kirin ne rêjîm û ne jî rikber e.

Di dema ku rêjîm ji pir aliyan ve lawaz dibû de, ji nişkê ve rêxistinek bi navê Rêxistina Dewleta Îslamî ( Da`iş ) derkete ser qada şer, û di demeke kurt de wek nexweşiyeke vegirtane ew li piraniya herêmên Sûriyê belav bû. Ev rêxistina tundrew û terorîst yekser şerê bêlûkên ku bi ser rikberê ve ne kir. Piştî ku wê hin bajar û herêm bi dest xwe xistin, her tiştek da alî û bi hemû çek û kiryarên terorî şerê Kurdan kir, û hîn jî ew şer berdewam e. Lê roj bi roj ew li pêş şervanê Kurd di sergoyê dîrokê de tên gevizanin.

Di vî warî de, pirsine mezin hene, û hîn bersivên wan ne diyar in, ew jî ev in: Da`iş kî ye? Kê ew çêkir? Çima civaka navdewletî wek tê xwestin şerê wê nake? Û herweha çima bermîlên teqîner ên rêjîmê di ser navendên vê rêxistinê de netên berdan?? Eger çeteyên vê rêxistinê di şerê bi Kurdan re bi sernakevin, çima pir dewletên herêmê li ser Kurdan çavsor dibin, û rayedarên wan li ser ekranên T.Vyan rê nadin hev û dibêjin: Yekîtiya ax û gelê Sûriyê çênabe kesek pê bilîze û perçe bike!! Lê ew ji bîr dikin ku ev bûne çar sal Sûriyê di hemû waran de tê parvekirin.



Eger mirov nexşeya şerê ku di hindurê Sûriyê de dibe, bide ber çavên xwe û wê baş raçav bike, birastî; dê bigîne vê encamê: *Şerekî cîhanî yê sêyemîn di xaknîgariyeke biçûk de ku navê wê Sûriyê ye dest pê kiriye*. Di vê navberê de, û dema ku pêwîst e ev şer were rawestandin, û di bin sîwana civaka navdewletî de çareyek jê re were danîn Rûsiya bûyeran germtir dike, û bi hêza xwe ya leşgerî dikeve nava qeyranê. Ev yek jî teqez dike ku temenê ev şerê qirêj dirêj e.

Ev destêwerdana Rûsiya ya leşgerî û carcarina jî hin rayedarên Emerîka radigihînin ku ewê navendine xwe ya leşgerî li herêmên Kurdî û nemaze li Kobanê ava bikin, û herweha Tirkiyê jî di keftelefteke de ye, ew jî hewl dide ku cihekî ji xwe re di Sûriyê de bibîne, ev tev diyar dikin ku pirojeya parvekirina Sûriyê hatiye amadekirin, û kar li ser wê tê kirin.

***Li Îraqê jî rewş ne dûrî rewşa Sûriyê ye.*** Li alîyekî Rêxistina Dewleta Îsalamî (Da`iş )........ 4

# AKP û Nijadperest Xewnan Dibînin!

Desteya sernivîser



Hilbijartinên 7ê Pûşberê (Hizîranê) ya perlementoya Tirkiyê bû bûyereke navbirî di dîroka Komara Tirkiyê (T.C) û Kurdistanê de. Cara yekê bû, ku rê ji gelê Kurd re li Tirkiyê vebû û kanî, bi vîna xwe, heştê nûnerên xwe bigihandana perlementa Tirkiyê. Ew encaman û rastiya berçav, sergêjiyeke mezin ji destlatdarên T.C û raya giştî ya tirkperset re çêkir. Bi rastî jî, wekî ku çawa ew encam ji ........... 5

**Rojhilata Navîn ...Dûmahîk**

bi hemû aliyên Îraqî re û nemaze bi Kurdan re di şerekî berfireh de ye. nakokî û carina jî şerekî sar di navbera Herêma Kurdistanê û Bexdadê de hene. Û herweha di navbera aliyên Îraqê yên ku bi hev re şerê Da`işê dikin de jî hene, û pir caran şerê çekdarî jî di navbera wan de diqewime. Wekî çawa destêwerdanên curbecur di Sûriyê de hene, û rojane rewş xerabtir dibe, herweha di Îraqê de jî hene, û ta niha çareserî li wir jî ne diyar e.

***Tirkiyê çi karî dike, û çi dixweze?*** Di destpêka qeyrana Sûriyê de, û ta niha jî Tirkiyê her di gurkirina şer de ye. Wê pir aliyên ku xwe wek rikbera Sûrî nîşan dane li Stembolê bi cîwar kirine, û tiştê ku li hindurê Sûryê bixweze di riya wan re dike. Yan din, ew ji roja roj de piştgiriya Da`işê jî dike. Piştî ku ew têgihîşt ku Da`iş di şerê li hembera Kurdan de bi ser nakeve, û ew nikare berjewendiyên wê bi cî wine, xwest xwe bike hevalê Hevbendiya Navdewletî ya ku ji bo şerê Da`işê çêbûye. Lê rastiya wê ne ew e, hîn têkilî û piştgiriya wê ji ev rêxistina terorîst (Da`işê) re nehatine birîn. Ya din, Tirkiyê hevpeymana di navera xwe û P.K.Kê de têkbir, û bi hêza xwe ya asîmanî herêmên çiyayê Qendîlê bombebaran dike. Ango wê dest bi şerê bi Kurdan re kiriye. Daxweza Tirkiyê ne rawestandina şerê ku li Sûriyê dibe ye, û ne jî şerê Da`iş û terorê ye, lêbelê şerê Kurdan e. Ji ber ku serkeftinên ku Kurdên Rojavê Kurdistanê bi dest dixînin, ew wek stiriyan di çavên wê de têne daçikandin. Lê ev şerê ku Tirkiyê bi kurdan re dike, ewê bervaja lê vegere, û li dawiyê encama wî serkeftina gelê Kurd e.

Eger mirov bûyer, şer û rewşa ku li Sûriyê, Îraq û Tirkiyê dibin baş bixwîne, ewê bigîne vê encamê: *Hevpeymana Saykis Bîko li ber rakirinê ye, û sînorine nû têne danîn.*

***Îran di çi çopilmê de ye?*** Hîn xewna Imberatoriya Sefewî ji serê Îranê ranebûye, ew dixweze di herêma Rojhilata Navîn de xwe bike yekem dewleta hêzdar, û destlatdarî û serweriya xwe li ser vê herêmê bimeşîne. Ji ber wê jî destêwerdana wê ya leşgerî di piraniya dewletên ku şer têde dibin de heye wek Îraq, Sûriyê, Yemen û Libnanê, û di pir dewletan de jî piştgiriyeke locstîk ji tevger û rêxistên Şî`î re dike, nemaze yên ku li dewletên Kendava Erebî.

Lê ew xewna ku di serê Îranê de li ber xwe dide, tucarî hişyar nabe, û çavên wê venabin. Ji ber ku gelên Îranî ew jî li ber şoreşeke pir bi hêrs in. Ji aliyekî din ve dewletên ku xwe wek serwerên cîhanê dibînin, tucarî serê Îranê bernadin ku ew bibe dewleteke mezin û serweriya Rojhilata Navîn bike. Lê hîn dem nehatiye ku hevsarê destêwerdan, serberdan û xewna Îranê were veçengandin. Bêguman ew dem ne dûr e.

Li gora xwendina me ji van bûyer û qeyranên ku li Rojhilata Navîn çêbûne re, û roj bi roj ew berfireh û dûrî çareserkirinê dibin, û aliyên destêwerdanan û nemaze yên leşgerî di wan de pir dibin, û di heman demê de dewletên Ewrupî ji pêlên koçberan hawar dikin, ev tev nîşanên destpêka nîvşerekî cîhanî yê sêyemîn in. Lê tenê herêma Rojhilata Navîn û derdora wê buhaya vî şerî bide.

**AKP … Dûmahîk**

gelê Kurd re bûn serkeftineke mezin û cidawaz, ew ji nijadperst, olperest û ji Partiya AKP ya Îslamewî re jî bû wek xewneke reş. Ji ber ku, wê yekê, rastî û bingehên siyasî, ramiyarî û dîrokî ya ku T.C li ser ava bûye ((Yek milet, yek ziman, yek al)) anîn xwar, û çavên raya navdewletî jî li ser gelê Kurd û rastiya hebûna wî û mafên wî vekirin. Hemî alî û kes jî têgihîştin ku tevgereke siyasî ye xurt li Kurdistana Bakur bi ser lingan ketiye û nêrîn û daxwaziyên rewa yên miletekî ku bi navê (Kurd) e, dinimûne.

Bêguman, encamên hilbijartinan li heza partiya AKPê û partiya nijad perest MHPê jî ne hatin. Loma jî wan xwast, di riya hilbijartinine nû re, rastiyên ku di hilbijartinên miha Pûşberê de derketine holê, biguhêrin, û rewşa perlemanî û siyasî wekî berê vegerînin, belkî kani bin jî dengên Partiya Gelên Demokratik HDP kêm bikin û daxînin bin asta serkeftinê. Baweriya bilind ew e, ku wê ûştê, û hîn çend roj di ser hilbijartinan re derbas ne bû bûn, li 20ê Pûşberê, xwekujekî ji regeza Tirk ku bi rêxistina DAIŞê re kar dikir, kumkujiya Pirsûsê(Sirûcê) ya qirêj pêk anî, û di encamê de bi dehan keç û xortên çepgir, ku ji hemî deverên Tirkiyê hati bûn daku alikariya Kobanê bikin, şehîd û birîndar ketin.

Li wê demê hin navgînên Mîdyayê destên xwe yekser dirêj istîxbarata Tirkiyê kirin û gunehê wê rakirin. Belkî wê lomê, û dako T.C gumanan ji ser xwe rake, û ji ber egerine din jî, ew razî bû ku baregehên xwe ji balefirên Emerîka re veke, û razî bibe ku bi şêweyekî yekser di şerê li dijî Daişa teror de beşdar bibe. Lê merca T.C ji bo wê yekê ew bû, ku Emerîka bipejrîne Rêxistina Dewleta Îslamî (DAIŞ) û Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) bi yek terezûya teroristî werin pîvan.

Li ber roniya wê hevtêgihîştina bi Emerîka re, û li dema ku firokeyên Hevpeymana Navdewletî ji baregeha Encirlîkê rabûn, bi dehan firokeyên T.C jî hêriş birin ser baregehên PKK li Herêma Kurdistanê, û bi dehan şehîd ji Hêzên Parastina Gel (HPG) û gundiyên Herêma Kurdistanê ketin. Di ber re, hêrisa girûpên nijadperstên Tirk jî li hemî bajarên Tirkyê li dijî Kurdan û arzûyên wan bilind bû, li gelek bajaran hêriş birin ser welatiyên Kurd ên bêsûc, bi dehan birîndar ketin û arzûyên wan jî hatin şewtandin û wêrankirin.

Di vê rewşê de, HPG û gelê Kurd neçar bûn ku berxwe bidin. Lewre li gelek bajarên Bakurê Kurdistanê çalakiyên berevaniyê rabûn, û di encamê de bi dehan çalakvanên Sivîl hatin kuştin, bi sedan birîndar bûn û hejmareke mezin jî hate girtin, û gelek bajar û navçeyên Kurdistanê jî hatin dorpêçkirin û mîna deverên leşkerî hatin nasandin.

Raya giştî dizane, ku ev şerê ku ji bêtirî sî salî de li Tirkyê û Bakurê Kurdisatnê dibe, bingeheke wî ya dîrokî heye, ew ji encama zor û setema li ser gelê Kurd hatiye. Û zane jî, ku di wan salên dirêj de, partiya PKK û serokê wê Ebdela Ocelan, gelek caran ji aliyê xwe de şer rawestandin, û ragihandine jî ku eger T.C li mafê Kurdan mikur were, ew amade ne çekan dînin û xebateke siyasî û sivîlane bikin. Lê dewleta Tirkiyê û Receb.T. Erdoxan, digel ku gelek sozên baş didan û çend gavên berçav jî avêtin, lê nikanî xwe ji nijadperestî toraniyeta ku T.C li ser ava bûye xelas bikira. Loma jî egerên gurbûna şer di navbera şervanên HPG û Hêzên T.C de hîn li dar in, zindî ne û hikardar in jî. Çare jî, wekî ku hemî demokratên Tirk û Kurd jî dibêjin, tenê di riya xebata siyasî û guftûgoyan re gengaz e. Û ev şerê ku roja îro dibe, tucaran nakeve xizmeta ne tirkan, ne Kurdan û ne jî tevahiya gelên Tirkiyê. Loma jî, gerek rojekê pêşde raweste û bi şêweyekî rast û durust û bi niyazeke paqij dest bi danûstandinên aştiyê bibin.

Di vê babetê de, û ji bo rawestandina ew şerê qirêj ku li Başûr Rohilata Tirkiyê dibe, û dijîtiya ku di navbera Kurdan û Tirkan de bi egera wê gur dibe, perlemenetra Kurd Xanim Leyla Zana ku gelek xelatên cîhanî wergitine, ji alavên navgîniyê ragihandin û wiha got: ((…gerek e ev şerê dînwer ku li Tirkiyê dibe yekser raweste, dilê me nagire em bibînin xort têne …. 7

**Li Efrînê … Dûmahîk**



bi nav kirin, hemî alavên xwe yên ragihandinê ji bo hilbijartinê bi kar anîn, navgînên gihandinê jî peyda kirin; Yanê, bi tevahî hemî karûbarên pêkanîna hilbijartinê li xwe girtin û bi destên xwe kirin.

Tiştê balkêş di hilbijartinê de, ew bû, cara yekê bû ku Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd- YEKÎTÎ ku li derveyî sazûmana TEV-DEM ye, bi namzet û dengdanê dakete hilbijartinê. Partiya YEKÎTÎ di daxuyaniya xwe ya beşdarbûnê de eger û pêwîstiyên beşdariya xwe di hilbijartinan li Efrînê wiha şirove kirin: ((.. ji bo ku welatî bihevojin ser pêkanîna mafê xwe yê hilbijartinî di hilbijartinên xwecihî de, û başdarbûneke çalak ji bo peydakirina tevgeraneke (Hîrak) civakanî ku li ser çanda welatînî û nirxa wekheviyê radibe, û ji bo hilgirtina berpirsiyariyê li hember metirsiyên îjdil ku li derdora navçê hene, û rewşên jiyanî yên ku navçe tê re derbas dibe, ew dijwarî jî ji ber berdewamiya hikariyên qeyrana babelatî ku bi salan e li ser welatê me Sûryê digere.. em di vê hilbijartinê de beşdar dibin..)).

Bi daketina Partiya YEKÎTÎ li hilbijartina serokên şaredariyan, heyamek baş ji çalakiyên siyasî û ji milmilaneya hilbijartinî re çê bû. Bi rastî jî wan çalakiyan, xwîneke nû bi civaka Çiyayê Kurmênc de berda. Li seranserê gund, bajarok û bajarê Efrînê jî, mehrecanên hilbijartinî çê bûn. Namzetan bîr û baweriyên xwe li derbarê gelek mijaran ji gelê xwe re gotin, pirs û pirsgirêkên wan danîn ber çavan, rewşa navçê ya dijwar dane nasîn, û metirsiyên ku hene jî anîn ser zimên. Hemî namzetan tekez kir, rewşa ku îro em tê de ne rewşeke pir nazik û awarte ye, ji bo derbaskirina wê jî pêdarî, yekrêzî, hezkirin ji hev û hilgirtina berpirsiayriyeke tevahî ji hêla her aliyekî, herkesî û her hêzeke siyasî de gerek e.

Beşekî baş ji xelkê me, di daketina partiya YEKÎTÎ ya hilbijartinan de hêviyek didît. Ew li bendê bûn, û hîn jî li bendê ne, ku hevkarî û tevkariya hemî aliyên siyasî li Çiyayê Kurmênc pêk were û xutir bibe, wan hêvî dikir, ku hilbijartin pak bin, daku bibin destpêka levkirinek durust di navbera hemî aliyên siaysî û civakê bi xwe de jî.

Lê belê, di karnava hilbijartinê û şêweya gerandina wê de, gelek tiştên şaş, ne baş û mixabîner derketin meydanê. Ew tiştên şaş li dereyî zagon û rêzanên hilbijartina yên ku Rêvebirya Xwesr bi xwe danî bûn bû. Zor mixabin, nemaze jî, ew kiryarên ne durust û mixabîner ji hêla gelek karbidestên Rêvbiriya Xweser û hen endam û alîgirên TEV-DEM bi xwe de hatin kirin.

Li derbarê ew tiştên neyasayî û destêwerdar ku di hilbijartinan hatin dîtin û tomarkirin, di daxuyaniya partiya YEKÎTÎ de wiha hati bû: ((.. Şêweya ku Hilbijartin pê bi rê ve çûn, nemaze jî roja dengdanê, rewşeke nebêlaneyî ye beloq ji hêla gelek serokên komîteyên sandiqan de hatin dîtin. Ji destpêkê de kertên dengdanê li gelek deran bi şêweyekî vebjartinî hatin belavkirin. Gelek kiryar û destêwerdan ji hêla navnasine ku li ser TEV-DEM têne jimartin de hatin kirin. Ew hemî tişt û rastî bûn wek destdirêjiyeke eşkere ji bingehên zagona hilbijartinê re, û ji maf û serbestiya dengdaniyan re bûn asteng û kelem. Ew tiştên şaş û destdirêjdar hîştin ku heyameke neyînî û tevleheveke mezin li roja hilbijartinê peyda bibe)).

Li ber roniya wan tiştan û çawaniya nebaş ku hilbijartina serokên şaredariyan pê li dar ketin, partiya YEKÎTÎ biryara xwe da, ku di hilbijartina ………… 7



# Kurd û Internet

■ Vejîna Kurd



Di serdema bîst û yekê de, teknolojî û pêşketina wê, ji hemû dewletên cîhanê re bûye girîngtirîn mijar.. ji ber ku pêşketinên teknolojî û zanyariyê bi xwe re pêşketinên mezin di hemû aliyên jiyanê yên aborî, civakî, zanistî, tendurustî û çandî de anîne. Internêt, televizyon, mobayl, komputer... û H.W.D hemû berên wê teknolojiya pêşketî ne û ew hemû dikevin xizmeta mirovahiyê. Bi lez jiyana mirov diguhêrin û pêşve dibin... Bêguman ew tev jî bandoreke mezin li hemû aliyên jiyanê dikin, ji danûstandinê de bigire heya li ser tendurustî û perwerdeyê, ji warên zanistî û aborî ve heya meydana siyaset û rojnamegeriyê.

Intirnêt, û bi taybetî Twiter û Faysbûk, tevlî ku hin aliyên xwe yên ku ziyanê didin jî hene, lê ew îro wek pêdiviyekê ne û nemaze ji bo me Kurdan, em bi tu awayî, bêyî bidestxistina van destkeftên han, nikarin welatê xwe bi pêş bixin û doza gelê xwe ji cîhanê re bidin naskirin.

Bikaranîna intirnêtê îro gerdûn bûye gundekî biçûk û sînorên netewî yên dewletan bê wate hîştine, mirov dikare bûyer û pêşketinan kêlîk bi kêlîk bişopîne... û ji ber ku internet alaveke azad e, her kes û her netew dikare çanda xwe bi zimanê xwe bi kar bîne û jê sûdê bigire, û eger rêjeya bikaranîna intirnêt di nav Kurdan de bilindtir bibe, ev sûdwergirtin jî dê pirtir bibe û herweha ew kêmasiya ku di ragihandin û rojnamegeriya ..........8

## AKP ... Dûmahîk

kuştin û em jî lê mêze dikin û bêdeng dimînin. Ustubariya her Kurdekî û Tirkekî ye ku li hember ev şerê qirêj ku li Tirkiyê dibe bisekine û wî rawestîne...)).

Di vî warî de, cîgirê sekretêrê partiya YEKÎTÎ rêzdar Mistefa Meşayêx jî, li roja 12/9/2015an bi navê ((partiyên Lêvegera Siyasî)), li ser rewşên ku li Bakurê Kurdistanê germ bûne, bi taybetî jî li bajarê Cizîra Botan, di daxuyaniyekê de eşkere kir û got: ((.. Em di koma partiyên lêvegera siyasî de, tundûtûjiya ku bi şêweyekî bi rêkûpêk ji hêla Erdoxan û partiya wî de li dijî gelê me li Bakurê Kurdistanê dibe şermezar dikin, û xebata birayên xwe li Cizîra Botan û li bajarên Kurdî yên din ji bo bidestxistina mafên wan ên netewî û demokratî silav dikin, û li hember destlatdarên Anqrê yên zordar li kêleka wan disekinin..)).

Bi rastî çavên çel milyon kurd li Rojhilata Navîn li Tirkiyê û li Bakurê Kurdistanê ne. Ew xebata gelê xwe li wî beşî ji Kurdistana xwe dişopînin, hemî jî hêvîdar in ku pirsgirêkên gelên Rojhilata Navîn bi şêweyên aştiyane werin çareserkirin û biratiya gelan were parastin. Û bila tu kes xewnan nebîne, û hewil nede ku dîrokê paşde bizivirîne.

## Li Efrînê ... Dûmahîk

encûmenên şaredariyan de beşdar nebe û namzetan jî jê re nede, daxuyaniyê wiha xuya kir: (( Biryara partiya me ew e, ku namzetan ji bo hilbijartinên endamên ecûmenên şaredariyan nede)). Lê belê wê tekez kir, ku mafê herkesekî heye ku biçe yan neçe hilbijartinan, ji ber ku ew mafekî kesane û rewa ye û gerek e herdem, eger erênî be yan jî neyînî be, ji hêla herkesî de were parastin. Lê belê tiştekî pir giring di daxuyaniya partiya YEKÎTÎ de ne hati bû gotin, ew jî ew bû, zor pêwîst û giring e ku TEV-DEM, wekî ku aliyê destlatdar û rêvebir e, lêvegereke rast û dudrust li şêweya ku hilbijartin pê hatin lidarketin bike, kêmaniyan nas bike û serast bike, kesên ku destdirêjî û destêwerdan jî kirine bide nasîn û seza bike. Ji ber ku, herêm herêma me ye, gel gelê me ye, xweserî xweseriya me ye jî, zor pêwîst e ku em li destpêkê, rêzdariya maf û daxwaziyîn gelê xwe bigirin û bibin mînakeke baş û balkêş ji hemî gelê Sûryê re. Yan jî emê ziyanê bibînin û destkeftiyên me jî wê bi ezeziya me ya siyasî û bi destên me ji dest me herin.

## Helbest….



■ **Axîn Welat**

Tirs
Em biçûk bûn û hîn jî,
Dayîkên me em bi bavan
ditirsandin.
Bavan jî bi Xwedê...
Hemûyan tirs bi hezkirinê ve grêdan,
Me ne ji bavan hez kir, bê tirs.
Ne ji Xwedê.
Hezkirin
Ne ji te hez dikim ji boy ku
helbestekê bi te binivîsim
yan perperîkekê bi xwe
Şad bikim.
Lêbelê ji bo ku tu
her nivîsandin
Û xwendina min bî.
Her tiştê qeyd dikim û
jê dibim.
Her tiştê bi bîr tînim
û ji bîr dikim.
Ji bo ku tu gava min
Ya yekemîn
û ya dawîn bî.
Ji boy ku
tu ez bim
Ez jî tu bî.

## Qamişloka birîndar

■ **Ebdil Rehîm Isma'îl**

Qamişlo birînek kûr
Ji nûvre li te derbû
Li nîva taxa Meyselûn
Tijî pêt û agir bû ......
Li bingiha tendirûstî
Dawiya miha Eylûnê
Milet li wir giha hev
Cî nema kes lê rûne
Dayika zarok anîn
Da ku wa biparêzin
Ji nexweşiyên giran
Da ku bidn wa derman
Derî li wan hate girtin
Melkemot hate xwestin
Giyan ji wa bistîne
Yek ji wan jî ne mîne
Melkemot karê xwe kir
Giyanê wan tevde bir....
Hiştin kuştî û birîndar
Dayîka di kirin hewar
Xweda binêre li xwar
Li vî miletê hejar ....
Li destpêka sibihê
Cihde li wa bû êvar
Dayîkê keça xwe bir
Hey dayîka dil kevir
Çawa tu vedigerî
Keça ciwan bi kû de bir
Bûye roja mehşerê
Li ser serê me kurda
Ax ji derdê felekê
Rokê dev ji me ne berda
Ew rondikê çavê min
Wek baranê têne xwar
Girî bûye karê min
Deng nema bikim hewar
Amûdê Helepça
Heskê û îro jî Qamişlo
sibe kî li ser rê ye nizanim
va me siparte te Xwedayê dilovan

**Kurd û Internet … Dûmahîk**

kurdî de heye, Kurd dikarin bi riya internetê ji holê rakin û her tiştê xwe "dîrok, ziman, folklor û çanda xwe" bighînin deh milyon kesan. Pir cihê ser-bilindî û kêfxweşiyê ye, ku îro bi sedan malperên kurdî hene û rojane ev hejmar pirtir dibe û naveroka wan jî dewlementîntir dibe û dikeve xizmeta doza kurdî. Di heman demê de pêwîst e Kurd ji vê pêşketina teknolojiyayê bê par nemînin û her kes, li gora kanîna xwe pê mijûl bibe û sûdê li xwe û miletê xwe bike.

# Nisrîn Ebdella ... Lehenga Gelê Kurd



Hersal li çarê meha Rezberê (Êlûl), Kongira Ewlehiyê ya Navdewletî (Globsêk) li bajarê Biratîslava peytexa dewleta Silovakiya li dar dikeve. Îsal dora 800 kesayetiyên siyasî û leşgerî ji seranserî cîhanê lê amade bûn. Jê rêber û serokên dewletan jî hebûn, mîna serokê firensî rêzdar Firanswa Holand. Di nava wan de du kesayetiyên Kurd jî hebûn; yek Rêzdar Felah Mistefa perbirsê karûbarên derve yê Herêma Kurdistanê, ya din jî serkirdeyek ji Hêza YPJ bi navê Nisrîn Ebdella bû.

Nisrîn Ebdella jineke Kurd e, di Hêza Parastina Jinê YPJ de ji berpisên rêza yekê ye. Ew bi şêweyeke fermî hati bû vexwandin, û di beşekî ji civînê kongirê de amade bû. Li derveyî kongrê jî, gelek hevdîtinên ji hêla beşdaran û Medyayê de pêre hatin kirin.

Piştre serbaza wêrek Nisrîn li dewleta Çîkê bû mêvan, li Çîkiya şalyarê berevaniyê, Nisrîn bi nîşan û xelata Berevaniyê ya dewletê xelat kir. Ew xelateke dewletê ye pir bilind e, wergirtina wê serfiraziyeke mezin e ji gelê Kurd re û ji xebata jina Kurd re bi taybetî. Spas ji lehenga Kurd Nisrîn re, wekî ku bû nûner û awêneyeke zelal û serkeftî ji doza gelê Kurd re li Sûryê, wê kani bû rûyê hevalên xwe û tevahiya gelê Kurd ê mirovanî û aştiyane li hember hêzên teror, nijadperest, olperest û tarî ji raya cîhanî re xuya bikira.

# Tendurustiya Jina Ducanî (avis)

Jiyana zarok ji deqa ku bi zikê diya xwe dikeve de dest pê dike. Lewre, gerek e ji wê katê de dest bi guhdana jiyana wî û diya wî bibe. Li serdema me, mal, civak û jin bi xwe jî di ber rewşa jina bi ducana de berpirsiyar in. Lê belê erk û berpirsiyariya mezin herdem di stuyê dayîkê, ango jina ducanî de ye. Çinkî, jin biçûkê xwe nehe mehan di zikê xwe de hildigire, bi şev û roj, kûve biçe û çi bike, ew herdem bi wê re ye û bi xwe re hildigire, loma jî her tiştê ku dayîk têre derbas dibe û dibîne, ta rewşa wê ya derûnî jî, hikariyê li biçûkê wê di zikê wê de dike.

Lewre, di wan nehe mehan de, ustubariyeke giring dikeve ser milê jina ducanî; ji aliyekî de, divê tendurustiya xwe baş biparêze, daku berê xwe bi rengekî tendurustî mezin bibe, û ji aliyekî din ve kani be bi hêsanî biçûkê xwe ji metirsiyan biparêze û bi silamet jî dîne.

Bi tevahî, ducantiya normal tucarî jiyana jinê asteng nake; ew kane bi şêweyekî asayî bijî, bixwe, vexwe û karên xwe yên rojane û heroyî(( اعتيادي)jî bike. Lê ji bo ku metirsî li ser biçûkê wê kêm bibin, û bi şêwekî xwezayî mezin bibe û were cîhanê, çend şorindiyên( (نصيحة giring hene divê netên jibîrkirin û pêbendî pê bibe, hinek ji wan ev in:

- Pêwîst e, jina ducanî rojê sê caran nanê xwe bixwe. Rast e ku hemî cureyên xwarinê ji wê re ne qedexe ne, lê divê meywe, keskahî, goşt herdem di xwarina wê de hebin. Çinkî, goşt (protîn) ji bo mezinbûna biçûk giring e, meywe û keskahî jî vîtamîn û me`denan ji govde re peyda dikin. Hemî cureyên ronavan( (سوائل jî ji ducaniyan re baş in, wek av, şîr, şîrav û hwd. Lê belê şîravên wek (meye û yên wek wê, hîç ne baş in. Û gerek e, nemaze jî di sê mehên dawiyê de, xo û xwarina şor jî hindik werin xwarin, çinkî ew avê di govdê ducaniyê de kom dike û zexta xwînê jî bilind dike.



- Hîç ne baş e, û pir bi ziyan e, ku jina ducanî cixarê vexewe. Ji bilî hemî ziyanên cixarê ku li ser tendurustiya her mirovekî dibin, ew li ba jina ducanî gelek metirsiyên îjdil çêdike, jê, yek: Gengazî bilind dibe ku biçûk berî dema xwe bibe, ew jî metirsiyeke mezin li ser jiyana wî peyda dike. Didu: Giraniya biçûk kêm dibe, ew jî dihêle ku ew zû nexwaş bibe û metirsî li ser jiyana wî hebe. Sedema sereke ji wan her du metirsiyan re ew e, ku kişandina cixarê, Okîcînê ji ser biçûk kêm dike û nahêle ew bi şêweyekî asayî û tendurustî di malçûka(Rehîm) diya xwe de mezin bibe. ……..... ⑩

Mînaka Kurdî

# ((Nan ji êlê, av ji golê))



Ew mînakeke kevin e, ji dema sazûmana(Sîstema) hoz û êlan de ji me re maye. Ew ji malbat, yan kesê ku bê kar, arzû û dahatî (mewrid) bimîne re tê gotin. Wê hîngê ew di nava êlê de bê kar rûdine; nên li ser wan dixwe û avê ji gola avê vedixwe. Yanê ew ji kîsê bilî xwe û belaş dixwe û vedixwe. Xuya ye, gava ku ew kesa demeke dirêj wilo dimîne, sinciyên wî jî têne guhertin, tembel û bêkêr dibe, naxawaze karekî bi sûde ji xwe re bike û ji berhema destê xwe bixwe. Wê hîngê ew li ser mirovên hozê (êlê) dibe bar û giranî, pêçiyên hemiyan bervê dibin û dibe ciyê loman. Lê ji ber ku ew hînî jiyana bêkar û bêkêr dibe, eyarê serê wî jî qaling dibe, şor tê kar nakin û herwiha hemî gotinan pişguh dike. Wê hîngê, dema ku gotin tê ser wî û ser bêkêrîtiya wî, dibêjin: Qey xema wî ye, ma ewê ji bo çi kar bike û xwe biwestîne, me ne ((nan ji êlê ye û av jî golê ye)), yanê jiyana wî parastiye, li belaşiyê dijî û şerm jî avêtiye, ma wê ji bo çi xwe biwestîne.

Gelê me; bila nanê me ji destê me be, û ava me jî ji kaniya dilê me. Xwedê me û gelê me ji tiştê nebûye biparêze û li ser zimanan negerîne. Bêjin: Amîn!!

### Beriya Cizîrê … Dûmahîk

dêran û qewlên perestgehên Êzîdiyan lê têne bihîstin. Doda, gundê min gundek ji gundên pirbelav e di Beriya Mêrdînê de.



Ji destpêka mirovahiyê ve şêngeh li beriya Cizîrê û Mêrdînê hatine avakirin, hesip lê hatine kedîkirin, genim lê hatiye çandin, erebe û tekel lê hatine çêkirin û her wiha gelek şûnwarên mirovahiyê lê têne dîtin...

Ji mêj ve, gelek şaristanî li ser xaka wê hatine avakirin, gelek nîjad têre derbas bûne, pêmayên xwe, şop û şûna xwe li ser xaka wê hiştine, mîna; Til Helef (Waşokanî), Til Birak (Qehat), Til Bêder (Nabada), Til Erbîd (Aşnakom), Til Mozan (Orkêş) û wiha Çaxir Bazar, Girê Êlûnê, Girê Bihemdûnê û bi sedan girên dîrokî yên din ku li beriya Mêrdînê û Cizîrê berbelav in.

Di ser xaka wê ya dîrokî re Sobarî, Somerî û Akadî derbas bûne, artêşên Hûrîyan, Hisîyan, Mîtanîyan û Aşûrîyan şerê hev kirine û tevan tovên xwe di xaka wan de çandine. Li wan deveran gelek caran Firs û Romê hev westandine. Di esmanê wan de dengên oldarên Somerî û Babiliyan bilind bûne, li ser peravên çemê wê dû`ayên xwedênasên Mîtanî û Aramiyan li hev vegeriyane... ev e Beriya Cizîrê û Mêrdînê, ev e dilê welatê me.

### Tendurustiya… Dûmahîk

- Gerek jina ducanî karên giran neke û tiştên giran raneke, nemaze jî di mehên destpêkê û dawiyê de, ji ber ku karên wilo, metirsiya jiberçûna biçûk bilind dikin. Lê ne tê wê wateyê ku ducanî karên xwe yên heroyî neke.
- Pir pêwîst e, ku jina avis werzişeke sivik bike, û li meha dawiyê ducaniya xwe, heroj bi qaserî nîvkatekê bimeşe. Çinkî, werziş masûlkên govde xurt dike û dihêle tendurustiya wê baş bibe, û biçûkê xwe jî bi şêwakî hêsan û tendurustî wîne.
- Gerek e jina ducanî mehê carekê here ba bijîşkê jinan, daku rewşa xwe û biçûkê xwe di bin çavan re derbas bike û nas bike. Çinkî gengazî heye, ku tiştên mîna pesta xwînê(dexit) li wê bilind bibe, yan rewşa biçûk di malçûk de ne durust be, ew jî buvehiyeke îjdil li ser ducanî û berê wê çê dike.
- Rewşa derûnî(nefsî) ji bo jina ducanî pir giring e. Pêwîst e rewşeke asayî û xweşbîn li derdora wê peyda bibe, çinkî mêlag bûye, ku ew ji jinê û ji biçûkê re jî pir bi sûde ye û morala jinê jî wê bilind dike.

Tendurustiyeke baş ji hemî xwendevanên xwe re hêvî dikin, nemaze jî ji jina ducanî û hemî zarokan re, ji ber ku ew paşeroja civaka me ne.

### Dîsa Koçberî! … Dûmahîk

û bajarên xwe derdikeve û berê xwe dide nediyariyê. Bûyerek e tarî ye dema mirov ji kok û derguşa xwe bi dûr dikeve û tamarên xwe di xak û hêlînên nû de bi cih dike. Ev koçberî îro bûye babet û cihê gengeşe û guftguyên her kesekî. Ji rohilat ta welatên rojava, hemû dezgeh û alavên ragihandinê, hikumet û dewlet îro bi koça welatiyên me mijûl in. Li vir li ser sedemên koçberiyê nanivîs im, ew bi giştî diyar in û eşkere ne, ji ber ku sedema sereke ev şerê qirêj û gemar li welêt e, her çi sedemên din jî hebin ew "zarokên" vî şerî ne, kaniya belan ev şera ye. Dixwazim li ser jiyan û rewşa penaberan li van welatan rawestim.

Piştî gelek tengasî û zehmetiyên li ser riya hatina welatên Ewrupa, riya derketina ji welêt û riya derya û sînorên welatan, meşa bi sed KM-an, metirsiya xeniqandinê di ava deryan de, razana li çol û daristanan, xapandina çete û diz û mafiya mirovan, xerckirina bi deh hezaran peran, zîndankirina mirovan di girtîgehan de, riswakirina ji aliyê pilîs û leşkerên dewletan de bi şêweyekî mirov xwe radestî dezgehên van welatan dike.

Di serî de wan di kampan de bi cih dikin, hin xwarin û vexwerinê bo wan penaberan peyda dikin, kurên axa û feqîran, dewlemend û belangazan, biçûk û mezin, zana û nezan, rewşenbîr û nexwende dikevin yek rêzê, ew tev li ba karmendê dewletê yek in, ew tev penaber in. Di mehên pêşî de, 25 Euroyan didin her mirovekî, ew 25 Euro têra çar paketên cixaran dikin..... Roja îro pêwîste 3-4 ta 6 mehan li benda hevpeyvînê rawste. Eger bû û bersiveke erênî hat, pêwîst e mirov di gelek zehmetiyên bîroqratî re derbaz bibe ta ku kani be malekê ji xwe re peyda bike. Roja îro ji ber pirbûna penaberan ew zûbizû peyda nabin. Li gelek bajaran penaber di salonên sportê de, di salonên şahiyan de, di bargehên leşkeran de; min dît di nexweşxaneyan de bi cih dibin. Îro bi cidî daxifin ku radeya peran kêm bikin, li şûna peran pakêtên xwerinê pêşkêşî penaberan dikin, di her pakêtekê de yek somin û du perçe penêr û yek kilo şekir û xoyê, her wiha du qutî leçer û mirîşkek û hin caran tûrek ard heye. Ew kesê difikire ku pere wek axê ne, ne rast difikirin.

Mirov çi kal çi pîr çi ciwan bêçare ye, mecbûr e here kursa zimên, li vir "ez dixwezim ez naxwezim" tune ye. Li gelek deveran çênabe mirov li bajarê ku dixweze bi cih bibe, ew nekane ji herêma xwe derkeve, ew mecbûr e di herêma xwe de xaniyekî ji xwe re peyda bike, mebest ji vê biryarê ew e ku giraniyê li ser bajarên mezin kêm bikin û wan di bajarokên biçûk de bi cih bikin, helbet di bajarên bicûk de derfetên kar kêm in.

Li gor mercên jiyanê li van welatan mirov qederê du -sê salan bê kar dimîne, ew kesê bi temen û bê sin'et tew her dem wê bê kar bimîne, an jî wê her karekî pê bikin ji paqijkirina kolanan ta karê di xweringehan de. Ew kesê parêzer, endezyar, mamoste û karmend ku bi pozbilindî dijiya, bila pozbilindya xwe ji bîr bike, gelek ji wan wê dakevin asta nîvkirêkarekî, tew ew jî bi dest nakeve.

Di van çend mehan de min bala xwe dayê ku gelek kes xwedî dîplome gihane vir, her piraniya koçberan xort in, ango temen di navbera 20-40 salî de ne. Ev bi her awayekî ziyaneke mezin e, valabûna herêmên me ji berhemdar û avakeran, di heman demê de jî qezencek e ji bo welatén Ewrupa.

Bi xwendina bûyera koçberiyé û zêdebûna penaberan re kom û komele û partiyên Ewrupa yên nijadperest ên biyanînehez çalakiyên xwe xurt dikin. Rojane kampên penaberan disutînin, rojana ew toşî hêrişan dibin, li her deverekê me guh lê ye çawa sixêf û gefan didin xelkê me û asta dijatiya biyaniyan bilindtir dibe. Her çendî xelk bi dilgermî pêşwaziya penaberan dike, her çendî alavên ragihandinê bi erênî wêne û bûyeran dinirxînin, her çendî siyasetvan û rojnamevan û rewşenbîr bi devliken li ser koçberan daxifin, lê di heman demê de, nijadperest jî xenata xwe berdewam dikin û ranawestin, ew metirsiyeke mezin e li ser jiyana xelkê me. Di meh û salên pêşî de hîn kesên me nikanin van çalakiyên nijadpetestan bi hişmendî binirxînin, ew hîn di bin bandora benca rewşa welêt de ne, ew wêneyên bajar û malên kavilkirî li welêt li ber çava ne, dema xwe digihînin van welatan, ew dibînin çendî jiyan li vir baş e û organîzekirî ye, her tişt li dûzan e, lê bi demê re ewên toşî gelek astengî û bûyerên ne baş bibin, hingê xelkê me wê ji qatê ezmanan yê xeyalan dagere jiyana te'el û bi xem û qisawet.

# Eliyê Ebdirehmên nas bikin

Mihemed Tobal

Eliyê Evdirehmanê Momin, li gundê ``Bereka`` Wanê li Bakurê Kurdistanê li sala 1920an ji dayîk bûye. Di temenê şeşsaliyê de, ji ber zulma ``Roma Reş`` bi malbata xwe re goçe Yekîtiya Sovyêtê bû.

Elî li sala 1937an li zanîngeha Yêrîvanê beşa mamstetiyê qedand. Û li sala 1949an jî li zanîngeha Bako paytexta Ezirbîcanê xwendina xwe di beşê ``Pedegojiya- zarokan`` de bi dawî kir. Wî di şerê cîhanê yê



Eliyê Evdirehmên

diwem de jî di nava ``Artêşa Sor`` a Soviyetî de şer kir. Piştre, li sala 1955an di rojnama ``Riya Teze`` de nivîsand û kar kir.

Li salên nodî ji sedsala borî, bû endamê ``Perlemana Kurdistanê li Derveyî Welêt``, ewa ku ji hêla PKK vê harti bû damezrandin.

Eliyê Evdirehmên nivîskarê roman, kurteçêrok, pend û şîret û helbestê bû, û werger jî dikir. Wî di jiyana xwe de gelek dîwan û pirtûk weşandin, jê:

Mirov- 1957. 2.Xatê Xanim-1959. 3.Gundê Mêrxazan-1968. 4.Şer di Çiyan de-1989. 5.Dê-Helbest. 6.Hesreta Min-Helbest. 7.Gulistan- Helbest… Û hinek din jî.

Eliyê Evdirehmên li sala 1994an li bajarê Bako çû ser dilovaniya xwedê û li wir hate veşartin. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike û cihê wî bihuşt be.

# Cureyekî Nû Ji Bapîrên Me



Li dehê miha Rezberê(êlûl), saziyên zanistî yên fermî li dewleta Başûra Efrîka ragihandin, ku lêkolîneran cureyekî nû ji nijadê mirov nas kiriye û bi ``Homo Nalîdî`` bi nav kirine. Lêkolîneran 1550 perçeyê hestuyên wî mirovî di şikefta bi navê (Stêrka Hilgerî) de dîtine. Diyar bûye, ku wî ren-gemirovî miriyên xwe di binê şikeftan de vedişart. Zaniyar dibêjin belkî ew regezê mirov yê pêşîn bû ku miriyên xwe vedişart, ew yek jî tenê ji taybetmendiyên mirov e.. Hestuyên ku hatine dîtin ên panzde qerqodeyên(Heykel ezmî) bûn, di nava wan de hestuyên zarokan jî bebûn. Li gora texmîna zanyaran û lêkolînên zanistî, temanê wan hestuyan di navbera 2 -2.5 milyon sal de ye. Zaniyar diyar dikin jî, ku Homo Nalîdî jîndarekî herî nêzîk bû ji nijada mirovê hişmend ve. Mejiyê wî dora 500mm3 bû, bedena wî



zirav û derdora 145SM-an bû, giraniya govdê wî jî dora 45KG-an bû. Lingên wî dirêj bûn, û tiliyên destê wî hinekî quloç bûn, ew jî destnîşan dikin, ku ew meşok bû û baş kanî bû hiLperikiya ser daran. Zanyar dibêjin, ev derande rêçeke nû ji bo naskirina çawahiya peydabûna mirov re li ser zemînê vedike.

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com